Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 95

15'ê Îlonê

Buha: 150 Tûmen

agirî

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

**16'hemîn Salvegera Terorkirina Şehîdên Berlînê**

16'ê Îlona 2008'an, 16'hemîn salvegera şehîdkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî bi destê terorîstên Komara Îslamî a Îranê ye. Em şehîdên Berlînê bi rêz û hurmet ve bibîr tînin.

Paşkoya taybet di hejmara tê a Agirî de. Li bendê bin.

# 14'HEMÎN KONGREYA PDK ÎRANÊ Bİ DAWÎ HAT




Di bin navê "Kongreya Pêşdeçûn û gelîtirkirina xebatê" de, 14'hemîn Kongreya PDK Îranê bi beşdariya endamên rêberî û nûnerên hilbijartî ên partiyê roja 10'ê Îlona 2008'an hate lidarxistin. Piştî 4 rojan karê berdewam û bêrawestan, Kongreyê roja 14'ê Îlonê dawî bi kar û xebatên xwe anî û azmûneke din a demokratîk di dîroka siyasî a vê partiyê de hate tomarkirin.

Di yekemîn civîna piştî bidawîhatina kongreyê de, Komîteya Navendî a Kongreya Çardehem, rêzdar **Mistefa Hicrî** wekî Sekreterê Giştî yê PDK Îranê hilbijart û ji kongreyê re hate nasandin.

Li gor bernameya PDK Îranê, Kongre organa herî bilind a partiyê ye û her 4 salan carekê tê lidarxistin.


Rapor û agahiyên berfirehtir di hejmara tê(96) a Agirî de dê bên weşandin. Li benda me bin.

**Daxuyaniya Komîteya Navendî Ya Hilbijartiya Kongreya Çardehem ...**




2

**Êrîşa Rûsya Ji Bo Gurcistanê ...**



3

**Bizava Neteweyî A Kurd Ji Nêrîna Dîroka Siyasî Ve**



5

**Rojane 300 Nûciwan Li Îranê ...**



7

**Azîneyên Perwerdehiyê**



9

# Daxuyaniya Komîteya Navendî Ya Hilbijartiya Kongreya Çardehem A PDK Îranê Bi Boneya Bidawîhatina Kongreyê



**Hevwelatiyên rêzdar! Xelkê azadîxwaz yê Kurdistanê!**

**Endam û alîgirên PDK Îranê!**

Em kêfxweş in ku bi agahdariya tev aliyekê rabigehînin ku Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê seet 16'ê êvariya roja çarşem, 10'ê Îlona 2008'an, Kongreya çardehem a xwe bi beşdariya endamên rêberiya partiyê û nûnerên hilbijartî ên partiyê lidar xist û piştî 4 rojan kar û xebata berdewam, roja yekşem, 14'ê Îlona 2008'an dawî bi kar û bernameyên kongreyê anî.

Komcivîna çardehem a partiyê di rewşeke taybet a siyasî di sewiya navneteweyî û herêmî de birêve çû, lewra li ser pirsên girîng ên têkildarî vê rewşê ku di rapora siyasî a Komîteya Navendî ji bo kongreyê de qala wan hatibû kirin, bas û şîrove hate kirin û bi hûrî, dûrbînane û berfireh ji aliyê beşdarên kongreyê ve hate nirxandin, bi awayekê ku rewşa kongreyê cew û atmosfereke bi tevahî siyasî bi xwe ve girtibû û di vê derbarê de bêmînak bû.

Beşdariya çeleng û hezkirina beşdarên kongreyê di wan bas û nîqaşan de heta astekê xuya û berbiçav bû ku dikaribe li gor kongreyên berê weke nimûne were hesibandin.

Ew rapora siyasî piştî du rojan bas û nîqaş û nêrînên beşdaran û dewlemendkirina wê, bi tevahiya dengan ji aliyê kongreyê ve hate pejirandin.

Xaleke din a karê komcivînê pêdeçûn bi ser bername û pêrewa hundirîn a partiyê bû ku berê gelaleya wê hatibû amadekirin û ji nûnerên kongrê re hatibû dayîn. Gelaleya han piştî derbirîna dîtin û nêrîna beşdarên kongreyê bi destkarî û guhartinan ve hate pejirandin.

Kongreyê bi liberçavgirtina erk û bernameyên partiyê ên pêşerojê navê **"Kongreya pêşdeçûn û gelîtirkirina Xebatê"** ji bo çardehemîn kongreya PDK Îranê re pejirand.

Di beşeke din a karê kongreyê de hilbijartin di navbera berbijarên endametiya Komîteya Navendî û Cihgirên Komîteya Navendî bi awayekî demokratîk û hemdem birêve çû û di encam de endamên Komîteya Navendî û endamên Cihgir ên Komîteya Navendî bi dengê beşdarên kongreyê hatin hilbijartin.

Di pêvajoya birêveçûna bernameyên karê kongreyê de, dehan peyamên pîrozbahî û piştevanî ji PDK Îranê ku ji aliyê rêxistin, partî û kesayetiyên siyasî ên Kurd, biyanî û Îranî ve gihîştibûn Kongreyê, hatin xwendin. Herwiha Kongreyê çend peyamên taybetî raberî malbatên Şehîdan, girtiyên siyasî, civatên xelkê Kurdistanê, endam û Kadro û Pêşmergeyên partiyê, Konseya Mafên Mirovan a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, Jinan, Ciwanan, Xwendekaran û Kongreya Neteweyên Îrana Federal kir. Di roja dawî a karê xwe de kongreyê pêşniyar û rênîşaniyên xwe ji bo rêberiya hilbijartî a Kongreya Çardehem a PDK Îranê gelale kir û pê sipart ku ji bo encamdan û cîbicîkirina wan hewlê bide.

Piştî ku Kongrê hemû erkên destnîşankirî ên xwe bicî anî, sibêdeya roja yekşem 14'ê Îlona 2008'an, dawî bi xebatên xwe anî.

Komîteya Navendî a hilbijartiya Kongreya Çardehem a PDKÎ, Kongreya Pêşdeçûn û Gelîtirkirina Xebatê, roja yekşem piştî dawîhatina karê Kongrê, di civîneke kurt de, rêzdar **Mistefa Hicrî** bi tevahiya dengan wekî Sekreterê Giştî yê PDK Îranê hilbijart û ev hilbijartine bi agahdariya endamên Kongreyê gehand ku tevî pêşwaziya germ a beşdaran rû bi rû bû. Rêzdar Sekreterê Giştî di civîneke beşdarên Kongrê de, derbarê hilbijartina xwe ji bo Sekreterê Giştî yê PDK Îranê de axavtinek kir û spasiya endamên Kongreyê û hemû wan kesan kir ku bi her curekê di rêvebirin û dabînkirina ewlekarî û tenahiya cihê Kongrê de beşdar bûn. Di doma axavtina xwe de, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê li ser pêşdeçûna partiyê û geşekirina xebatê tekez kir. Hewce ye bê gotin ku belgenameyên Kongreya Çardehem a partiyê di pêşerojê de dê ji rêya dezgehên ragehandina partiyê ve belav bibin û hemû aliyek dê ji wan were agahdarkirin.

**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**
**Komîteya Navendî**
**Hilbijartiya Kongreya Çardehem ya Partiyê**
**14.09.2008**
**24.06.1387**






Rêzdar Mistefa Hicrî wekî sekreterê Giştî yê PDKÎ hate hilbijartin

www.arsivakurd.org

# Êrîşa Rûsya Ji Bo Gurcistanê Û Çend Notek

**Erfan Rehnimûn**





Piştî hiloşîna Soviyetê û rûxana Peymana Werşoyê, guhartineke girîng di hevkêşeyên siyasî ên cîhanê de derket holê û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê xebat kir ku ji wê derfeta girîng û zêrîn mifaha pêwîst werbigire û ew welatên ku li pey hiloşîna Soviyetê bi serxwebûnê şad bibûn, ji xwe nêzîk bike û bi bihêzkirin û berfirehkirina Natoyê ji bo Rojhilatê Ewropayê, valahiya çêbûyî a ji ber hiloşîna Bilûka Sosyalîstî tejî bike û bi vî awayî bibe hêza herî bibandor di hevkêşeyên siyasî û aborî de.

Lê di wan çend salên borî de, Rûsya bi sedema berhemanîna Vejenê heta qasekê kariye di bin dar û perdikên hiloşîna Soviyetê, rast bibe û bi baldan bi hewcehiya bêrade a Ewropa ji bo enerjî û vejena Rûsyê, Moskovayê kariye cihwarek girîng di hevkêşeyên siyasî-aborî ên cîhanê de bidestve bîne û bi êrîşa Rûsyayê bo ser Gurcistanê, Moskovayê sîgnala han avête Waşîngtonê ku Rûsya niha, ne Rûsyaya dehsala nodan a Zayînî ye û divê Amerîka û Yekîtiya Ewropayê bêtirî caran Rûsiyê bixwînin û berjewendiyên wê biparêzin. Şaşiyeke bê vir û wir e heke em bifikirin ku piştî êrîşa Rûsyê ji bo Gurcistanê, cîhan ji bo rewşa Şerê sar vegeriyaye, ji ber ku ji aliyekê ve, derfeteke zaf maye ku Rûsya him di warê aborî û him di warê siyasî de bikare weke serdemê Soviyetê li hemberî Waşîngtonê bisekine û ji aliyekî din ve jî, vêc û berjewendiyên Waşîngton û Moskovayê di Konseya Ewlekarî ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî û welatên 5+1 û G8 û Navenda Bazirganiya Cîhanî de, ji vê yekê tevlihevtir e ku ew du welat bikarin weke dema Şerê sar bi hev re û hevkêşeyên siyasî û aborî ên niha yên hev, tevbigerin.

Lê eva ku di vê derheqê de mirov dikare balê bikişîne ser, eva ye ku ne Rûsya, Rûsya dehsala nodan e û ne jî ji Waşîngtonê re çê dibe ku weke çend salên berî niha yekaliyane hewl û cehda guhartinan di hevkêşeyên siyasî de bide. Lewra mirov nikare îro weke cîhana yek cemserî şirove bike û di her guhartineke siyasî de, kirinên bêtirî cemsereke tên dîtin. Lewra pêwîst e, tevgera rizgarîxwazane a Kurdistanê siyaset û stratejiyên xwe bi hevkêşeyên hêzên niha re rê bixe.

## 50 Kes Ji Hevwelatiyên Kurd Li Sûriyê Bi Cezayê Zîndanê Hatin Mehkûmkirin

Li gor raporên Ajansên Nûçeyan, Rêxistina Mafê Mirovan li Sûriyê, roja yekşem, 14.19.2008’an, li Şamê daxuyaniyek da çapemeniyê û ragihand di dadgehekê li Sûriyê, 50 kes ji Kurdên vî welatî, bi tawana beşdarîkirin di meşa nerazîbûna xelkê li Qamişloyê, bi 6 meh cezayê zîndanê hatin mehkûm kir.

Saziya Parastina Mafê Mirovan li Sûriyê di daxuyaniyekê de diyar kir ku sê kes ji parêzerên Kurd ên girtî yên Sûriyê û çend nûner ji balyozxaneyên welatên Amerîk, Almaniya û Fransayê, beşdarî civîna wê dadgehê bûn.


Parêzerên Kurd ên girtî yên Sûriyê ragihandin 50 hevwelatiyên zîndanîbûyî yên Kurd li Sûriyê, li gor madeya 357 a yasay cezayan li Sûriyê bi tawana pêkanîna nakokiyên eşîrî, olî û regezî û haydan bona pêkanîna pevçûna di navbera hêzên vî welatî de, bi 6 meh cezayê zîndanê hatine mehkûmkirin.

## 270 Kes Ji Çalakên Sivîl Yên Bajarê Merîwanê Piştevanî Ji Gireva Girtiyên Kurd Kirin

Komîteya piştevanîkirin ji gireva birçîbûna zîndaniyên siyasî û sivîl yên Kurd, ragihand 270 kes ji çalakên çandî û sivîl yên bajarê Merîwanê di daxuyaniyekê de, piştevaniya xwe ji gireva girtiyên Kurd diyar kirin.

Çalakên siyasî û sivîl yên Merîwanê, di beşek ji daxuyaniya han de, nerazîbûna xwe li hember dana biryarên giran û neyasayî ên desthilata dadweriya Îranê bo ser çalakên siyasî û sivîl yên Kurd û rewşa nebaş a girtîgehê, diyar kirin.

Di dawiya daxuyaniyê de, navê 270 kes ji çalakên çandî û sivîl yên bajarê Merîwanê ku daxuyaniya han îmza kirine, hatiye.



## PDK Îranê Girtina Telal Mihemed Mehkûm Kir

**Telal Mihemed**, endamê rêberiya Rêkevtina Demokratîk a Kurd li Sûriyê, roja



24.08.2008’an, ji aliyê hêzên ewlekarî ên rejîma Bees li bajarê Qamişlo, di Sûriyê de hate girtin û piştre ji bo bajarê Hesekê û li wir jî bo bajarê Şamê hate veguhastin. Niha derheq rewşa navhatî tu agahiyek berdest nîne.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, serbarê mehkûmkirina girtina Telal Mihemed, daxwazê ji hemû komele û hêz û navendên parêzerên mafê mirovan dike bona rizgarkirin û serbestberdana Telal Mihemed, rêberê Kurd hewlê bidin.

www.arsivakurdi.org

# Bizava Neteweyî A Kurd Ji Nêrîna Dîroka Siyasî Ve

**Beşa 7 Û dawî**

**Bêhzad Xoşhalî ***
**Wergeran ji Farsî/ Omîd Esxeran**

**Qazî Mihemed û Komara Kurdistanê**

Bizava Qazî Mihemed ji ber rûçikê cuda û taybetmendiya siyasî û nûjen a wê, weke girîngtirîn bizav di dîroka siyasî a Kurd de tê hesibandin. Taybetmendiya herî berbiçav a bizava Qazî Mihemed ku dbû sedema avabûna Komara Kurdistanê di salên 1946 – 1947'an, taybetmeniya demokratîk a wê di kiryarê de bû ku heya niha jî weke mînakek ji bo avakirina sîstemên demokratîk di herêmê de tê zanîn.

Kiryar: Bizava Qazî Mihemed
Sebeb: Qazî Mihemed
Biyav:

A) Cih: Beşên berçav ji Kurdistanê li başûrê Azerbaycana Rojava(herêma Mokiryan) û beşek ji bakurê parêzgeha Kurdistanê(Bane û Seqiz) ku wê demê weke beşek ji herêmên Azerbaycan û Erdelanê bûn.

B) Dem: 1944 – 1947
Alav: Bizava çekdarî û pêwendiyên dîplomatîk
Armanc: Avakirina Komara Kurdistanê

Her weke ku hate gotin, taybetmendiya herî berçav a Komara Kurdistanê bi rêberiya Qazî Mihemed, rûçika demokratîk a wê ye ku li gor pêkhate, şirove û cihgirbûnê ve, xwediyê çarçoveyek nûjen bûye û dikarî ku li gor pênase û pîvanên demokratîk hatiba nirxandin. Li gor nêrîna han û bi liberçavgirtina teoriya nû a demokrasiyê anku demokrasiya bazarê, demokrasiya Komarîxwziya nû, demokrasiya bav serdestî û demokrasiya Jakponî, em dikarin Komarê li ser bingeha demokrasiya Jakponî şirove bikin ku tê de em dikarin buha, nirx û asteke zaf a beşdariya siyasî mêze bikin. Her di vê demokrasiyê de, em dikarin girîngiya hebûna peyvên neteweyî û gel di çarçoveya têgihek civakî de bibînin ku serbarê pejirandinê, nasnameyek siyasî bixwe ve girtiye û di têgiha razîbûna neteweyî û kevneşopa netewebawerî de, tê xuyakirin.

Xalek din ku di Komara Kurdistanê de tê dîtin, têgiha netewebawerî a wê ye ku wek peyvek nûjen, dibe nasînerek civakî ji merivan re ku xwe weke nasnameyek cuda di çarçoveya sîstema siyasî, herêmek coxrafiyayî û çandek cuda de pênase dike.

Taybetmendiya sêyem a Komara Kurdistanê, em dikarin di rola Qazî Mihemed de bibînin. Serbarê vê çendê ku Qazî Mihemed kesayetiyekî olî û xwediyê hitbar û nifûzek bihêz a malbatî bû û gellek kesan jî rola olî – karîzmatîk ji bo wî pênase dikirin, lê nabe ku hêza eqlanî a wî di xwe zanînê, diyarîkirina hêl û aliyan, hevahengî, rêxistina derk û pêkanîna wan di sîstemek piraktîzebûyî bi navê Komara Kurdistanê de jî, nehê baskirin.

Girîngtir ji vana, taybetmendiya olî – malbatî dibe sedem ku xelk serbarê sehên eşîrî û hin caran jî navendxwaz, di navendekê de werin organîzekirin û bi nasînek ducarkî, ji wan re hêz û pêjna "Em bûnê" were dayîn, emên ku di dawiyê de, berpirsiyariya rengvedana nirx û buhayan dide şêniyan û weke îdeolojiya neteweyî, nasname û kesayetiya neteweyekê nîşan dide. Taybetmendiyeke din a Komara Kurdistanê, ewlebûna zirûfan ji bo qonaxa derbazbûn ji pêkhateyek kevneşopane ber bi oragnîzasiyonek nûjen e. Avabûna Komeleya (J.K) yan jî Civata Vejiyana Kurd ku di bin bandora Partiya Hîwa di Kurdistana Îraqê de bû û her wiha pêkanîna wê weke rêxistinek nepenî, bi girîng û pûtezanîna Kurdbûn û di berdewamiyê de jî guhartina wê bi Partiya Demokrat a Kurdistanê ku xwediyê çarçove û pêkhateyên partiyek nûjen û bi diyarîkirina daxwaz û xwestekên gelê Kurd di çarçoveya partiyekê de, yek ji taybetmendiyên berbiçav ên Komara Kurdistanê di wê demê de bûn.

Taybetmendiyên din ên Komara Kurdistanê, xistine rojeva daxwazên nûjen di qonax û herêmek diyarîkirî a coxrafiyayî de ku di rastî de ne Komariyê nîşan dide û ne jî demokrasiyê. Xistine rojeva Komariyê li cem têgiha demokrasiyê di welatekê de ku Şah perestî tevlî hizr û ramanên wî welatî bûne, xalek pîroz û pirrbuha bû ku bingeh û mercên sereke ên wê pêkhateyê, haydarkirin û haydana xelkê ji bo mirovperweriyê bû.

Hewl ji bo avakirina perwerdeyek nûjen di herêmên bin desthilatdariya xwe de, birêveberîkirina sîstema dadê, derbazbûn ji eşretîbûn ber bi Kurdbaweriya neteweyî, derbazbûn ji ferq û cudahîdanînên olî ber bi pejirandina çend olîbûn û piloralîzma olî, peymana stratejîk tevî Azeriyan û pesendkirina hin lihevhatinan ji bo lagirîkirin ji kêmaniyan di çarçoveya bin desthilatdariya xwe de, cihgirkirina sîsmeta ewlekarî a nûjen, belavok û çapemeniyên azad û hewl ji bo berfirehtirkirina çapemenî û ragihandinê, perwerdehiya bi zimanê Kurdî weke zimanê fermî û zimanên din di Kurdistanê de, avakirina Radyoya Kurdistanê û armancên demokratîk di biyava hikûmetî a Kurdistanê de, ji taybetmentiyên din ên wê qonaxê bûn.



*** lêkolînvan û nivîskarekî ciwan yê Rojhilatê Kurdistanê**

Di biyava ragihandinê de em dikarin bi awayekî dokumentî qala belavokên weke "Nîştiman", "Hawarî Kurd", "Hawarî Nîştiman", "Kurdistan", "Helale" û wd..., bikin. Her wiha em dikarin îşarê bi tekezkirina Komarê li ser mafê çarenivîsê ji bo gelan, mafê diyarîkirina çarenivîsê ji bo gelê Kurd, mafê serxwebûna gelan, hewl ji bo pêkanîna Komeleya hişyarkirinê ji bo gelê Kurd, liv û tevgerên çandî û kulturî, aştî û demokrasî ji bo cîhanê, çûn bo nav biyavên kulturî û civakî û kêmrengkirina nêrînê eşîretî, neteweyî û olî ku bi awayekî zelal dihatin dîtin, bikin.

Girîngî û pûtedana Komara Kurdistanê ji jinan re û diyarîkirina komîteyek taybet ji bo şûndeçûna kar û barên jinan di bin çavdêriya rasterast a Qazî Mihemed de, di demekê de ku di Rojhilata Navîn de, jin weke meriv nehatibû nasîn, ji Pêşewa Qazî Mihemed û Komara Kurdistanê re, mînakek ji bo rêberî û desthilatdariyê çê dike ku bi mêzekirina wê, em dikarin gellek usûl û pîvanên demokratîk ku ji aliyê cîhana îro ve jî hatine pejirandin, bidest bixin.

Qazî Mihemed di demên dawiyê de jî ji bo buhadan bi demokrasî û mafê xelkê, mirina xwe jî avêt ber dengdana xelkê heya ku ji ber hizrên wî ên nû û nûjenxwaziya wî, tu zirar û xisarek negihîje xelkê û eva jî dibe ku weke girîngtirîn taybetmendiya Komara Kurdistanê û Qazî Mihemed were hesibandin. Komara Kurdistanê weke niqteya destpêka hilbijartinek siyasî ji bo demokrasiyê di biyava desthilatdariya otorîteyan di Rojhilata Navîn de tê hesibandin.

www.arsivakurd.org

# Kanalên Televîzyonî Yên Parêzgehan Di Pêxema Çi Proje Û Armancan De?

**Azad Kurdî**

Cîhana ku em îro tê de dijîn, xwediyê hezaran cure ziman û zaravan e û her gelek beşek ji nasnameya xwe a neteweyî di zimanê xwe de dibîne, da ku ji rêya ziman ve hest, xwestek û daxwazên xwe bixin rojevê. Zimanê zikmakî yê her neteweyekê roleke girîng û sereke di prosesa perwerde, fêrbûn, dan û wergirtina zanyarî û wd dilîze, lewra hewce ye ku di pêxema mifahwergirtina herçiqas zêdetir di fêrbûn û standina zanyariyan û xurtkirina bîr û hizra mirovan de, derfet û firsenda mifahstandin ji zimanê dayîkê û bikaranîna wê di hemû qonaxên perwerdehî, xwendin û tev warên civakê pêk bihê. Nemaze bikaranîna zimanê zikmakî di medya, çapemenî û navendên çandî de, bandoreke mezin û sereke di parastin û bihêzbûna ziman de dilîze. Rewşa han zêde ji bo wan welatan digunce ku di çarçoveya tixûbên welatên han de pirzimanî heye. Di wan cure welatan de, divêt qîmet û giraniya hemû zimanan bihê parastin û mafê bikaranîna ziman bi navendên xwendin û perwerdehiyê, medya û çapemeniyan bê ferq û cudahîdanan bê berçavgirtin.

Bo nimûne di welateke weke Îranê de ku pirneteweyî, pirzimanî û pirolîtî heye, lê hemû baldan û derfetek bi zimanekê tê dayîn, ango Farisî. Rewşa han ê bûye sedema vê çendê ku zimanên gelên din bikevin perawêzê û heta bên qedexekirin û bi çaveke ewlekarî ji wan were lênêrîn û gelên Îranê ji wî mafê sereke ê xwe hatine bêparkirin. Rastiyek ku nahê înkar û haşakirin eva ye ku 30 sal e di din desthilatdariya rejîma Komara Îslamî a Îranê de bi eşkere rewşa han bi ser çarenivîsa neteweyên Îranê zal e. Ev siyaseta cudahîdananê ê bûye sedema serhildana gellek kirîz û pirsgirêkan û neteweyên Îranê ji vê rewşê nerazî ne. Di Îranê de ku zimanên Azerî, Kurdî, Erebî, Belûçî, Turkmenî û wd hene, pûte û girîngî tenê bi zimanê serdest, ango Farisî re hatiye/tê dayîn û ji ber terxannekirina îmkan û hewcedariyên pêwîst bona bihêzkirin û pêşdebirina zimanê wan gelane di warên perwerde, zanistî û çandî de, roj bo rojê kirîza zal xirabtir dibe û rewş aloztir û pirsgirêk kûrtir û berfirehtir dibin.



Li piraniya welatên weke Japon, Endoneziya, Kanada, Hindistan û wd ku pêkhateya wan pirneteweyî ye, em dibînin ku serbarê girîngîdana taybet a berpirsiyarên fêrkirin û darêtina bernameyên çandî ên wan welatan bi zimanê fermî yê welat, di pêkanîna warên hewce ji bo hînkirin, xurtkirin û pêşdebirina zimanê gelên nav sînorên wan welatan, ji tu tiştî dirêxiyê nakin. Di encama wê polîtîka durist de, bi hevre jiyana aştiyane, hevgirtî û yekparçe a vî welatî zêdetir tê parastin, mekanîzm û rêbazeke lojîkî ku 30 sal dibe desthilatdarên rejîma Komara Îslamî a Îranê înkara wê yekê dikin û berevajî hemû wan welatan tevdigerin ku rewşeke weke Îranê hene û di vî warî de pirsgirêkên xwe çareser kirine. Heta di vê heyamê de, ji rêya piratîzekirina esla 15 a Qanûna Bingehîn a xwe jî ku ew maf bi fermî nas kiriye, tu kar û projeyek nehatiye meşandin.

Karnas û pirsporên vî warî dibêjin, xurtkirin û girîngîdan bi zimanê zikmakî dibe sedema pêşketina zanistî, çandî, perwerde û hînkirin û wêjeyê li dor wan welatên ku bi hêcet û mihaneyên bêbingeh weke gef bo ser ewlehiya neteweyî, parastina çarçoveya tixûbên coxrafî û pirr mark û teşenên din ji bo bikaranîna zimanê gelên din, di vê rêyê de bi awayekî cur bi cur hêcetan digirin.

Ji bo nimûneya vê rastiyê, em dikarin Îrana bin desthilatdariya rejîma Komara Îslamî bas bikin. Li gor ew lênihêrîn û fakterên ku me li jor qala wan kir, gelo li Îranê ji bo zimanên gelên ne Fars, tu gavên hewce hatine avêtin? Gelo di bingeh de, di vê rêyê de, tu guhertin û kiryarên micid, hewce û piratîkî hatine avêtin? Çima di siyasetên giştî û piroje û bernameyên perwerdehiyê de ji dibistanê heta zanîngehê tu derfetek ji bo zimanên ne Fars nehatiye berçavgirtin? Gelo ew mentiq û lojîke, Îranê dê ber bi pêşerojeke geş û ronak bibe an rewş ji vê yekê ku heye, dê aloz û tevlihevtir û kambaxtir bike? Li ser vê mijarê pirr pirsên din ji mirov re tên holê ku her yek ji wan hewcedarê dahûrandin, lêkolîn û nirxandineke berfireh û tevalî heye... .

Vê dawiyê kanalên televîzyonî ên Parêzgehên Îlam û Kurdistanê ketin ser satelîtê û kanala Zagros a Kirmaşanê jî ku car û bar weşanê dike û piştre li ser satelîtê namîne! kanalek jî bi navê Azerbaycan ev çend sal dibe ku ji bo parêzgeha Azerbaycana Rojava, di rojê de çend seetan bernameyan belav dike. Ji bo her 4 parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê, ev 4 kanal weşanê dikin ku midehek dibe hemû ketine ser satelîtê.

Nirxandina naverok, erk û armanc û zimanê kanalên han ên televîzyonî ku ji bo parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê bernameyan belav dikin, hewcehî bi derfeteke zaf heye, lê di rasî de, bi liberçavgirtina wan xalên jor, li dor kiryar û karnameya bernameyên wan kanalane, vê şik û gumane pêk tîne ku hinek armanc û sedemên taybet di bin pirojeya avakirina van kanalane de

www.arsivakurd.org

hene.

Ewa ku pirr xuya û berbiçav e, eva ye ku rayedarên rejîma Komara Îslamî a Îranê dixwazin bi destpêkirina bernameyên wan kanalan ji bo parêzgehên Kurdistanê, berengariyê tevî temaşekirina kanalên Kurdî û hinek kanalên Farsî jî bikin ku li Kurdistana Başûr û welatên Ewropa û Amerîkayê belav dibin, heta bi vî awayî qas û hejmara bînerên wan kêm bikin. Eva di halekê de ye ku xelkê şiyar û têgihîştî ê Kurdistanê erk û siyasetên wan du girûpên kanalan ji hev cuda dikin û dizanin ku deng û rengê xwe li kîjan yek ji wan kanalên televîêzyonî peyda bikin.

Çavnihêrî û şîroveya piraniya xelkê ji bo armanc û bernameyên binav kanalên parêzgehan eva ye ku pûte û girîngiyek xasmanî ji çand û kultura neteweyî, bihêzkirin û pêşxistina ziman û wêjeya Kurdî, zindîkirina folklor û nirxên çandî, nasandina cihwarên dîrokî, çêkirina bernameyên cur bi cur bi awayên festîval, konfernas, semînar, civîn û komcivînên zanistî û wêjeyî ji bo nasandina wêjevan, hunermend, nivîskar, rewşenbîr, helbestvan û wd re bidin. Ev xalên ku me bas kirin, daxwaz û çavnihêriyên herî kêm ên gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ne ku divêt li hember wan kanalên televîzyonî de hebin. Li vir pirsek li ser wan binav kanalên televîzyonî ên parêzgehan ku Komara Îslamî ava kirine, tê rojevê, gelo kanalên han ên parêzgehan heta çi qasekê dê rêhêsaniyê bikin û delîveya vê yekê ji bo wan girûpan ku dikarin di vî warî de bixebitin û hewlê bimeşînin? Girtî û daxistîbûna çarçoveya kar û xebatên wan kanalane yê bûye sedema dilsarî û xemsariya piraniya xelkê li hember wan kanalane. Heta di nav civakê de rexe û gazindeyên zaf li ser naverok, ziman û awayê karkirina wan televîzyonan tê xuyakirin. Ji ber ku piraniya xelkê 4 parêzgehên Kurdistana Îranê Kurd in û zimanê wan yê neteweyî Kurdî ye, lê yê ku bi kêmî û hindik pê re kar tê kirin û bername tên pêşkêşîkirin û weşandin, zimanê Kurdî ye. Çunkî xebatên wan kanalan di bin bandor rasterast a rejîma desthilatdar de ye. Hejmara ew bernameyên ku bi zimanê Kurdî di wan kanalên televîzyonî de tên belavkirin, gellek kêm in û ji vê yekê girîngtir ew ziman û edebiyat e ku hinek caran bi Kurdî program pê re tên pêşkêşkirin, zimaneke nivîşkan, tevlihev û têkel bi farsî û dûr ji peyvên şirîn û dewlemend ên Kurdî bi vî awayî ne tenê zimanê Kurdî jar û qels dikin, belku tu xizmetekê bi xurkirin û pêşxistina zimanê Kurdî nakin.

Wisa tê xuyakirin ku naveroka piraniya herî zêde a bernameyên wan kanalan ji aliyê kesên ne xwecih tê darêtin, an hin kesên nêzîk an ser bi desthilatê di wan parêzgehên Kurdistana Îranê de zêrevanî û çavdêriyê bi ser de dikin.

Bêguman her piroje û bernameyek ku di xizmeta xwestek û daxwazên rasteqîn û çavnihêriyên civatê xelkê de nebin, bê bandor dibin û nikarin rol û dewra xwe ya eslî û sereke bilîzin. Bi baldan bi awa û çawaniya siyasetên çêkirina bernameyên çandî ên Komara Îslamî, em bi erxayînî ve dikarin bibêjin û bigihîjin vê encamê ku armanc ji avakirina wan kanalan, tevlîhevkirina ziman û wêjeya Kurdî û bangewazî ji bo siyasetên qirêj û xapîner ên Komara Îslamî a Îranê li derveyî sînoran e, lê Komara Îslamî bi van fêl û xapandinên xwe nikare rûçikê bêyom û reş ên xwe biveşêre.

## Şiroveya Peyvên Siyasî

Berhevkar: Omîd Esxeran
omid_anbi@yahoo.com

# MATİRYALÎZM

Matiryalîzm ji têgiha "Matiere"ê bi wateya made û ji bingeha peyva latînî a "Materio"ê ku tê wateya felsefeya madî, hatiye wergirtin û ji alîgirên vê hizrê re jî matiryalîst anku ew kesên ku madeyê bi bingeha jiyanê dihesibînin, tê gotin.

Felsefeya matiryalîzmê bawerî bi madegerayiyê heye û tenê wê bi rast û girîng dizane û wê weke bingeha jiyanê dihesibîne. Naveroka hizra han li her li ser vê yekê hatiye danîn ku hemû nîşan û berhemên jiyanê di pêxema madê de ne.

Di rastî de matiryalîzm zanistek nû nîne, belku xwediyê dîrokek du hezar salî ye û her ji destpêka serhildana zanist û felsefê ve bala zanayên cîhanê ber bi aliyê xwe kişandiye. Lewra beşa herî zaf a fîlesofên Yûnanê û beşek berbiçav ji fîlesofên Ewropayî matiryalîst bûn û made weke sedema tim guhartinên cîhanê dihesibandin. Ji vana em dikarin qala **Dîmokrît**, **Îpîkûr**, **Lokris**, **Tomas Habz**, **Bîkon**, **Foyerbax**, **Dîdro** û **Lok** bikin. Di sedsalên 18 û 19'an de, ji ber pêşveçûna bilez a zanist û lêkolînan li Ewropayê, felsefeya Matiryalîstê bala piraniya zanayan ber bi aliyê xwe ve kişand û delîveyek baştir ji bo perwerde û hînkirinê pêk anî.

Alîgirên vê hizrê li ser vê baweriyê ne ku felsefeya Matiryalîzmê hevhêl tevî zanista mirovî di liv û tevgerê de ye û di encama vê çendê jî de berfirehtir dibe. **Hiraklît** ku weke bavê diyalektîkê hatiye nasîn, di serdemê xwe de li ser vê baweriyê bûye ku tu tiştek di cîhanê de sekin nîn e û hemû tiştek di halê liv û lebatê de ye. Gotina han nîşanderê vê çendê ye ku fîlesofê han bawerî bi madeyê hebûye û hemû guhartinek bi madeyê ve girê dida. Matiryalîst li ser vê baweriyê ne ku di navbera rih û madê de pêwendiyek rastarast heye, ji bilî vê çendê jî made li jor ruhê ye. Lewra jî ew li ser vê baweriyê ne ku sedema hizirîna mirov ji ber vê çendê ye ku ew xwedî mejî ye û hizr û raman han ji mejiyê wî/ê ve çavkaniyê digirin. Lewra jî ew kesane serbixweyiya han li ser canliber û seranserê jiyana mirovî de giştgirtir dikin û madê weke bingeha hemû tiştekê dizanin û wê weke heqîqeta vê cîhanê dihesibînin. Her wiha li ser vê baweriyê ne ku made heta hetayî û bîdawî ye û regeza han a sereke ye ku tim jiyana me dagirtiye û tucaran jinav naçe û hertim heye û dê hertim jî bimîne.

Matiryalîzma zanistî a Habz ku bi Mîtodsantîfîk bi nav û deng e, ji aliyê wî ve di sedsala 17'an li Îngelterayê, hatiye avakirin. Habz yekemîn fîlesofê mezin yê sedsalên nû ye ku hewl da felsefeya siyasî digel sîstema nû a hizrî û şêwaza nû a hizirînê bihev re girê bide û li ser bingehek zanistî wê ava bike û netenê hemû rastiyên xwezayê belku hemû liv û tevgerên meriv çi takekes û çi jî civakî bi baldan bi xalên jor de hatî, di felsefeya xwe de biguncîne.

Peyvek din jî bi navê matiryalîzma diyalektîk "Dialectic Materialism" heye ku ji aliyê Marks ve li hember diyalektîka îdiyalîzm a Hîgil hatiye danîn. Hizra han li ser bingeha xurtgerayiya dîrokê yan jî hewcehiya dîrokî û kemilîn û sê fakterên têz, antî tez û sentêz hatiye avakirin. Marks bawerî bi hêza aborî hebû û ew weke hîmê bûyerên dîroka mirovaniyê dihesiband û hêza berhemanîn û aboriyê weke hêza hayder dizanî. Lê Hîgil berevajî wî, hêza rihê weke hayderê cîhana mirovahiyê zaniye. Di rastî de Marks aborî û matiryalîzm dixiste nav çarçoveya lojîk û diyalektîka Hîgil û şêwazên wî jî ji bo selimandin û îsbatkirina bîr û hizrên xwe bikar dianî û bi vî awayî teoriya komonîzma nû anî rojevê.

**Çavkanî: (Ferhengî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî (Danêşnamêyê Siyasî) "Politicial Dictionary" Daryûş Aşorî**

www.arsivakurdi.org

# Rojane 300 Nûciwan Li Îranê Tûşî Madeyên Sirker Dibin

**Rapor: Agirî-Beşa Civakî**

Navenda Saziya Netewî a Ciwanan, bi belavkirina serhejmariyekê derheq rewşa bengdariyê li Îranê, ragihand: Pitir ji yek milyon kes ji begdaran di Îranê de, li jêr temenê 19 saliyê ne û temenê bengdariyê di vî welatî de gihîştiye 13 saliyê.

Saziya Netewî a Ciwanan herwiha di rapora xwe de îlan kir: Rojane 300 nûciwan li Îranê, tûşî madeyên sirker dibin.

Serhejmariya han seetekê piştî axavtina Îsmaîl Ehmedî Muqedem, Fermandarê hêzên Întîzamî û Serokê Navenda Xebat li dijî Madeyêm Sirker, di konfernaseke çapemeniyê de hate belavkirin. Îsmaîl Ehmedî Muqedem, di konfernasa han de îdea kiribû ku hêzên Întîzamî yên rejîma Komara Îslamî karîne di heyamê kêmtirî salekê de, asta bikaranîna madeyên sirker di Îranê de ji 700 tonê, bigîjîne 200 tunê. Wî herwiha zêde kir û got ku li Îranê bi giştî 1 milyon û 160 hezar kes tûşî madeyên bêhişker hatine û di nava vê hejmarê de tenê 40 hezar kes di jêr temenê 20 saliyê de ne.

Gotinên bê binyat yên Ehmedî Muqedem, di demekê de bû ku Ajansa Nûçeyan a “BRNA”yê, (Navenda Fermî a Saziya Netewî a Ciwanan), ragihand:“ Serhejmariyên herî nû derheq temenê bengdaran li Îranê dide xuyakirn ku temenê bengdariyê ji 17 saliyê gihîşte 13 saliyê”.

Her li gora serhejmariya han, pirraniya kesên ku madeyên sirker bikar tînin, di navbera temenê 18 heya 30 saliyê de ne.



Di rapora han de ku ji zarê çavkaniyên haydar di Navenda Xebat li dijî Madeyên hişber de hatiye belavkirin, dibêje: %69 ji xelkê bengdar li Îranê **tiryak**ê bikar tînin, **hiroîn** bi %26’an, di pileya duyem de ye û **heşîş** bi %5’an, di pileya sêyem de cî girtiye. Herwiha di rapora Saziya Netewî a Ciwanan de hatiye tekezkirin ku pêka lêkolînên encambûyî yên herî nû asta hezkirina ciwanan bona bikaranîna du madeyên nû û pirr xeter bi navên **kirak** û şûşe bi awayekî metirsîdar li halê jordeçûnê ye.

Ji aliyekî din ve temenê mifahwergirtin ji dermanên şipestayî li Îranê gellek jêrde hatiye. Di vê derbarê de Muhsên Ferîdî, berpirsê giştî yê Navenda Piştgîrî ji Xesarên Civakî a ser bi Wezareta Perwerdehiya Îranê, çend mehan berî niha ragihand: Pêka lêkolînên ku me encam dane, temenê bikaranîna dermanên şipestayî ji 15 saliyê gîhîştiye 13 saliyê.

**Bengdarî Li Îranê Di Temenê 10 Saliyê De**

Ebulqasim Tosî, berpirsê giştî yê Saziya Bextiyarya (Bêhzîstî) parêzgeha Sîstan û Belûçistanê di hevpeyvîna xwe a tevî rojnameya “Hamshahri”yê de, ragihand: %25 ji bengdaran li Îranê bikaranîna madeyên sirker di dema xwendinê de dest pê kirine. Wî herwiha zêde kir û got: Temenê bikaranîna madeyên bêhişker di nava xelkê parêzgeha Sîstan û Belûçistanê de gihîştiye 10 heya 15 saliyê.



**Hejmara Bengdaran Li Îranê:**

Herçend ku berpirsên rejîma Komara Îslamî a Îranê û navendên haydar derheq hejmara bengdaran li Îranê, ên ser bi vê rejîmê, qet serhejmariyeke rast û cihê baweriyê nexistine ber destê xelkê. Lê li gor rapora sala 2005’an a Saziya Netewên Yekbûyî, hejmara mutadan li Îrana bin desthilata rejîma Komara Îslamî, heya 10 milyon kesan hate texmînkirin. Herwiha rojnameya “The New York Times” jî, vê dawiyê derbarê rewşa xirab a bikaranîn û kişandina madeyên bêhişber di Îranê de raoprek nû weşand û eşkere kir ku bêtirî 10 milyon bengdar bi tiryak, hiroyîn, heşîş, kirak, şûşe û curên din ên madeyên sirker di vî welatî de hene.

Gişt karnas, xesarnasên civakî û pisporên vî warî, sedema sereke a kirîzên weke tûşbûna xelkê bi madeyên bêhişker, jodeçûna xizanî, fehşa, nexweşiya “HIV”yê, helatina mêjiyan, xemokî, xwekujiya û hwd... vedigerînin ser bêkariyê li Îranê.



www.arsivakurd.org

# Li Bajarê Merîwanê Semînara "Ferhengnivîsîn Di Zimanê Kurdî" De Hate Lidarxistin

Roja 31'ê Tebaxa 2008'an, semînarek li jêr navê **ferhengnivîsîn di Zimanê Kurdî de** li hola Komeleya Çandî-Hunerî a Merîwanê hate lidarxistin. Di semînarê de sedan kes beşdar bûn û heta êvariya wê rojê dom kir. Di vê semînarê de çendîn kesên şareza û pispor di warê ferhengnivîsînê û nirxandina ferhenga kurdî de, li pirraniya bajar û herêmên Rojhilatê Kurdistanê beşdar bûn.

Di destpêka xebatên semînarê de, li ser navê desteya rêveber a semînarê û Komeleya Çandî-Wêjeyî a Merîwanê xêrhatina beşdar û mêvanan hate kirin, piştre merem û armancên wê semînarê hatin şirove û baskirin.

Di beşa din ya semînarê de, dor gihîşte xwendina gotar û mijarên ku ji festîvalê re hatine şandin. Di vê beşa programên semînarê de, bername bi vî awayî birêve çûn.

Axavtina **Mihyedîn Kerîmiyan**, endamê Girûpa Ferhengnivîsîn a Zanîngeha Kurdistanê

Gotara "Ienihêrîneke şiroveyî ji Ferhenga Zanîngeha Kurdistanê û rola wê di warê ferhengoknivîsîna hemdem de", nivîsara **Ehmed Ehmediyan** ji Zanîngeha Azad a Merîwanê.

Axavtina **Macid Merdûx Rohanî**, êdîtorê Ferhenga Farsî-Kurdî a Zanîngeha Kurdistanê.

Gotara "Rexneya ronveker a ferhengnivîsîna Kurdî" nivîsîna **Kamran Mihemedrehîmî**, endamê Lêjneya Zanistî a Zimanê Kurdî-Tehran.




Gotara "Kirîza ramanê, xurbeta teknîkê", nivîsîna **Riza Şecîî**, endamê Lêjneya Zanistî a zimanê Kurdî-Tehran.

Gotara "Ferhengnivîsîna Kurdî li 1970-1984'an", nivîsîna **Dr. Hîmdad Husên Bekir** ji Zanîngeha Selahedîn ya Hewlêrê ku bi sedema berlêgirtin ji beşdarînekirina nivîskar, gotara wî ji aliyê kesekî din ve hate xwendin.

Gotara "Dengên Avestayî di zîndana nenivîsînê de", nivîsîna **Cefer Serîşavayî** li bajarê Bîcarê ve.

Gotara "Dem û geriyan di peyvdana Kurdî de", nivîsîna **Kawe Kerîmî** li bajarê Merîwanê ve.

Programên semînarê yên piştî nîvroyê, bi awayê jêrîn birêve çûn:

Pêşkêşkirina gotara "Pirsgirêkên ferhengnivîsîna Kurdî" ku ji aliyê **Dr. Sebah Reşîd Qadir**, mamostayê Zanîngeha Selahedînê, hatibû nivîsandin.

Pêşkêşkirina gotara "Pirsên diyarîkirina peyvan di ferhengnivîsîna zimanê Kurdî de", ji aliyê **Enwer Merîfet** li bajarê Dîwandere.

Xwendina gotara "Dîroka ferheng û pirsgirêkên ferhengnivîsînê di zimanê Kurdî de", ji aliyê **Suhêyla Mihemedî** li bajarê Sine.



Pêşkêşkirina gotara "Bostan bijareyê dixwaze", ji aliyê **Mêhdî Senendecî**, endamê girûpa ferhengnivîsîna zanîngeha Kurdistanê.

Xwendina gotara "Çend têdîtinek derheq ferhenga Kurdî" ji aliyê **Dr. Talib Husên Elî**, mamostayê zanîngeha Selahedînê, li Hewlêrê hatibû nivîsandin, lê seba beşdarnebûna navhatî , gotara han ji aliyê kesekî din ve hate pêşkêşkirin.

Di beşa dawîn a semînarê de, dormêzek ji bo **Ezîz Nasirî**, **Dr. Hadî Muradî**, **Macid Merdûx Rohanî**, **Hemîd Konepoşî** û **Reûf Rehnimûn**, hate lidarxistin.

Hêjayî gotinê ye ku çendîn kes li Başûrê Kurdistanê, bi armanca beşdarîkirin di semînara han de, gotarên xwe şandibûn, lê seba berlêgirtina rejîma Komara Îslamî, wan nekarî di semînarê de beşdar bin.

www.arsivakurd.org

# AZÎNEYÊN PERWERDEHIYÊ

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Zayend, nijad, temen û pîşeyê mirov çi dibe bila bibe, bivênevê di gellek merhaleyên perwerdehiyê re derbas dibe. Destpêka vê merhaleyê, malzaroka dayîka mirov e.

Perwerdehiya ku di malzarokê de dest pê dike, hîmê perwerdehiyê ye û tevê temenê mirov têkildar dike. Bi vegotineke din, baş xerab, her mirovê jîndar di van merhaleyan re derbas dibe û perwerde dibe. Ji bo wê hewce ye ku azîne, rêgez û rê û rêbazên perwerdehiyê baş werin zanîn û bikaranîn. Digel ku gellek rê û rêbazên perwerdehiyê yên zanistî hebin jî, bi kurtayî be jî em dixwazin li ser hîn azîneyên ku hemû mirovên perwerdekar eleqedar dike, rawestin.

Divê mirovê/a perwerdekar, aliyê xwe yê qels û bi hêz ji hevdû veqetîne û xwe baş binase. Divê aliyê xwe yê hêzdar û fêdewar derxe pêş; aliyê xwe yê qels bibîne û xwe di wê hêlê de hêzdartir bike.

Divêmirovê/a perwerdekar, di karê xwe de bibe kesê/a herî behredar û serkeftî û hîndariyên xwe yên cehd û xebatê gurrtir û zêdetir bike. Ji bo ku bikaribe bi ser bikeve û nêzîkahîtêdan û stratejiya xwe diyar bike, divê mijar û babetên xwe zelaltir û dahûrandinên xwe xurtir bike. Divê, ji hempîşe û pisporên perwerdehiyê sûdê wergire û azîneyên wan ji bo xwe wekî rêber bibîne.

Divê mirovê/a perwerdekar, li gorî rewşa asayî tevbigere, belê ji rewşên awarte û neyinî nepelikîne. Divê, ji bo çareserkirina pirsgirêkên heyî bi berpirsiyarî tevbigere. Her wiha divê ji bo dîyalog û hevdîtinên tekîlî pirsgirêkan guncan û amde be. Divê, li dijî azîne û rêbazên qalingirtî û paşmayî bertek nîşan bide û li dewsa wê, vebijarkên (alternatîfên) erênîtir pêşkêş bike.

Divê mirovê/a perwerdekar, li hember hemû kêşe û arîşeyên perwerdehiyê bi sebr û tebat tevbigere û azîneyên aqilane û zanistî bi kar bîne. Divê li hemberî hemû rewşên awarte xweşbîn be û ji bo serkeftinên xwe yên mezin jî nefsbiçûktiyê bike.

Divê mirovê/a perwerdekar, ji ber serkeftinên xwe yên bêhempa xwe qure neke û hêz û hezkirineke mezin bide kesên serkeftî û serfiraz. Divê ji ber serfiraziyên xwe serbilind be; belê gava ku bi ser neket jî divê têkçûnên xwe qebûl bike. Her wiha, divê li sedema têkçûnên xwe bigere û çewtî û xeletiyên xwe sererast bike û biedilîne.

Divê mirovê/a perwerdekar, ji bo ku bi ser bikeve, biryardar be; bi hewldan û jidil bixebite û têbikoşe. Divê rewşa hînbûn û hînkirinê baş binirxîne û encameke erênî bi dest bixe. Divê xala esasî baş bipeydîne û ji bo wê bi biryar be. Û divê di biryara xwe de rewşa xwe ya erênî û neyinî li ber çavan bigire.

Divê mirovê/a perwerdekar di pîşe an jî qada xwe ya zanînê de xwedî zanîn û agahî be; ango pisporê karê xwe be. Divê bi cil û bergên xwe, bi gotin û vegotinên xwe, bi lêvkirin û axaftinên xwe, bi têkilî û danûstandinên xwe her gav bibe mînak. Çi di civakê û çi jî di sazî û mezrîngeyên perwerdehiyê de dibe, divê bi dilsozî û berpirsiyarî û ahengdarî tevbigere.

Divê mirovê/a perwerdekar, şagirt û xwendekarên xwe baş binase û ji bo ku baş perwerde bibin hewl bide û ji bo vê yekê bê navber û bêdeman têbikoşe. Divê, baş bizanibe ku şagirt û suxteyên wî/wê ji çi hez dikin (kêfa wan ji çi tiştî re tê) û li gorî wê azîneyê zaneyane bi kar bîne. Divê, bi berfirehî peydandina asta wan î zanînê bike û wan li gorî behreyên wan, arasteyî serkeftinê bike.

Divê mirovê/a perwerdekar, bikaribe rê li ber şaşî û xeletiyan bigire û şaşî û xeletiyên şagirt û suxteyên xwe bi zimanekî nerm sererast bike û biedilîne. Divê, li hemberî şagirt an jî xwendekarên xwe rêzdar û dilovîn be. Divê li hemberî wan re tu carî gotinên çors û nelirê neke. Divê, dilawerî û wêrekiyê bide wan û serkeftinên wan ji dil û can pîroz bike.

Divê mirovê/a perwerdekar, şagirtên xwe derbarê bûyer û qewmînên rojane yên civakî, komelayetî û gerdûnî de agahdar bike û wan bûyeran rave û şîrove bike. Divê, vegotina xwe kurt, belê ya şagirtên xwe berfireh û dûvdirêj bigire. Divê, gotina wan nebire û di dawiya axaftina wan de spasiyên xwe diyar bike.

Divê mirovê/a perwerdekar, berpirsiyariyê bide şagirtên xwe ku bikaribe wan der barê karekî de peywirdar bike. Belê divê peywira wan tu carî ne zêdeyî hêz û qaweta wan be ku bikaribin karê xwe pêk bînin. Divê bizanibe karê wan bi wan bide hezkirin ku bikaribe serkeftina wan hêsantir bike.

Divê mirovê/a perwerdekar, ast û behreyên şagirtên xwe baş peyidîne û li gorî wê awa û şêwaza fêrbûn û hîndekariyê bi kar bîne. Divê rê li ber hevrikiya şagirtên xwe bigire û her yekî/ê di warekî de( li gorî zanîn û behreyên wan) bigihîne û wan perwerde bike.

Bi kurtayî, pêşî divê mirovê/a perwerdekar bi xwe baş hatibe perwerdekirin û di warê perwerdehiyê de pispor û zana be. Heke na, ne dikare xwe û ne jî şagirtên xwe ji karesat û babelotên demê reha û rizgar bike.

Kaniya Helbestan

## Çend Wêneyên Helbestan



**Ebdulrehman Bamernî- Duhok**
**bamerni77@yahoo.com**

**Pêşmerge**

Her buhosta pêyê xwe lê danêyî
Şonpêyên min in û
Gulleyek ya vêketî!
Har dara mezina bigehiyê û
Li bin sîbera wê birûnê
Gorê şehîdekê ye û
Divêt sirûda ey reqîb li ser bixwînî...

**Tiberk**

Li pehnatiya
Bajêrê ez lê ji dayîk bûm
Maç û sondên xelkê
Destên şêxî bûn
Piştî maçên tlstaran
Maçên şêxan jî
Berîveyî bajêrî bûn

**Viyan**

Ez digel te bûm
Her ji vê roja
Te bi dehmena kirasê xwe yê sor
Erd di dû xwe ra dimalî
Dûmahîk rojên westiyayî
Bi du sê çîkên xwîneka sor
Ah û ohên şîrekê
Dibişavtin û
Her gava îlhama şîrê gîr û biba jî
Tu dinalî

**Çinar**

Bêyî te
Wek pîre çinareka
Ketiye ber pêlên bayê û
Tu şîrên min nabînî
Yan sate wextekê
Bikeviye ber şaşa komputerê
Mesceka bitinê
Bo min bişînî

**Sond**

Her ji vê roja te viyayî
Gevzkanî digel şîrên min bikey
Mezintirîn sonda te xwe pê zincîr dayî
Digel dirêje piyasên min
Kit û ciwanê pê dihate kirin..

www.arsivakurdi.org

Dengê Rojava

# Zeviyek Gazîdan a Mele Nûriyê Hesarî



Besam Mistefa

**Mele Nûrî kî ye?**

Navê wî yê bi rastî Mele Ûsiv e. Li gundê Hesarê yê ser bi devera Kerecosê li Bakûrê Kurdistanê di sala 1934'an de hatiye ser rûyê dinyayê. Di temenê 8 saliya xwe de, li ser destê bavê xwe fêrî xwendina Quranê bûye. Di xortaniya xwe de, berê xwe dide gundê Til Marûf ya girêdayî bajarê Qamişlo û li wir xwendina feqetî û oldariyê li dirêjahiya deh salan dixwîne heta ku îcaza xwe distîne. Piştre, li gellek gundên navçeya Cizîra Sûriyeyê Meletiyê dike wekî gundên Mehmûdiyê, Cerade, Letîfiyê û Til Husênê. Dema temenê wî dibe 30 sal, talênta wî ya helbestê berz dibe û ew bêtir bala xwe dide ziman û hozana kurdî. Hin berhemên wî li ser irûzên hozanê hene digel gellek destnivîsên wî yên li ser wêje û helbesta kurdî ku hêjî nehatine çapkirin. Ji destpêka sala 1967'an de, ew li bajarê Qamişlo dirûne, li taxa Qenat-siwêsê. Mele Nûrî kitêbxaneyek zindî ye, zimanzanekî mezin e û bi zimanên Kurdî û Erebî û Farisî dizane. Çend dîwanên wî jî hene, lê piraniya wan nehatine çapkirin. Ez dê di vê gotara xwe de li ser dîwana wî ya bi sernavê"Zeviyek Gazîdan"ê rawestim.

**Zeviyek Gazîdan**

Mele Nûriyê Hesarî yek ji hozanvanên me yên kilasîk e. Weke piraniya helbestvanên me yên kilasîk yên dinê, ew jî di bin bandora mezinên me de maye yên wekî Melayê Cizîrî-Ehmedê Xanî-Feqiyê Teyran-Pertewê Hekarî-Melayê Bateyî û yên dinê.

Mele Nûrî bi taybetmendiyeke xuya a di warê kûrbûna wî di zimanî de û guhdana wî bi dîrok û kelepor û folklora gelî de, dikare di nav rêza van navan de ciyê xwe bê dudilî bigire: Cegerxwîn, Namî, Tîrêj, Keleş û hinên din.

Zeviyek Gazîdan di nav rûpelên xwe de baqek ciwan û rengereng ji helbest û hozanên kurdî yên ku bi rîtim û kêşe û qafiye hatine hûnandin, vedihewîne. Mele Nûrî dîwana xwe diyarî "canê serokê nemir Mele Mistefa Barzanî" dike. Zeviyek Gazîdan wek aşkera ye ji komek gilî-gazîdankan tête hev. Di nav de gazîdankên şînê, gazîdankên hîndişî, gazîdankên rewş-welatî, weynetî, hêwrî, rabûrî, gazinî, tepling, zor lê hatin, hişyarî, her weha ji dîlokên hûrzê yên sivik û giran, û çepdest û hilkutana pêk têt.

Mele Nûrî di warê zimanê Kurdî de behr e. Di zimên de kûr çûye û xwe gihandiye durr û gewherên zimanê Kurdî yên bela-wela û veşartî ji ber rewşa bindestiya dirêj ya bi ser gelê Kurd de hatî. Zimanê Mele Nûrî di Zeviyek Gazîdan ê de rewan û zelal û herikbar e. Ew bi kurdiyeke xurû, paqij û çêjder hestên xwe yên cihê cihê derdibire û arastey hezkerên hozan û gotina kurdî ya resen dike. Taybetmendiyeke Melê ya di warê zimên de heye û aşkeraye. Rast e, hin wekhevî û dubarekirin di meydana hozanvanên me yên kilasîk de heye, lê belê Mele Nûrî xwedî nimûşeyek cuda û taybet e, ji gencîneyeke peyvên kurdî yên resen û watedar û ji ferhenga Xanî û Cizîrî ya berfireh û herdem nû, mînanî mircan û morîkan, peyv û gotinên xwe yeko yeko hildibijêre û li pey hev rêz dike.

Dilê Melê yê nazik û bi kurpe-kurp her ji boy gel û welatê wî, lê dide. Jiyana xwe û temenê xwe bi temamî ji zaroktiyê bigire heta niha ku gellek yextiyar bûye û bi nexweşiyê jî ketiye, di ber doza û çanda û hozana gelê xwe de buhurandiye. Dilê wî her bi kurdî lêdaye, bi kurdî ramiyaye, bi kurdî liviyaye, bi kurdî giriyaye, bi kurdî nivîsandiye, bi kurdî jiyaye û dê bi kurdî bimire jî. Dev ji hertiştî berdaye û di rêya hest û raman û di rêya dilê xweyî saf de barkiriye şax û çiyayên welatê xwe, û her piştevan û xewnparêzê pêşmerge û qehremanên şoreşên kurdî bûye, bi taybet şêre bazê çiyayên kurdistanê Barzaniyê mezin.

Mele Nûrî bi xêz û hozanên xwe dengê xwe li nav dol û newal û şax û çiyayên Kurdistanê belav kiriye; saw û xof xistiye dilê dijminan de û aramî û mêranî û wêrekî xistiye dilê şervan û têkoşerên Kurd de.

Mele Nûrî di hemû boneyên netewî de milletê xwe bi tenê nehiştiye û weke xortekî çardesalî, mil bi mil, bi xort û qîzên kurdan re ketiye dîlan û govendan de û mizgîniya roja xêrê; roja azadî û serbixweyiyê daye law û keçên gelê xwe.

Di jiyana milletê Kurd de, roja here bi xêr û bereket; roja geşbûn û rizgarbûna neteweya kurd roja anjî Cejna Newrozê ye. Eve jî çîroka vê roja bi xêr û bi mibareke:
Di demeke kevn de, li welatê bapîrên kurdan, padîşahek hebû, navê wî Dehak bû. Dehak, keyekî pirr zalim bû. Wî welatê kurdan wêran kir. Di gund û bajaran de mirov nehiştin. Dehak tu kes ji xwe mezintir û di ser xwe re nedidît. Ji kuştin û wêrankirinê têr nedibû. Şevekê, Dehak xewneke xirab dît. Nîvê şevê, ji ber êşeke dijwar ji xewê şiyar bû. Gazî zana û bijîşkên li qesrê kir û ji wan re got:
- Ji ber vê êşa dijwar xew nakeve çavên min. Zû ji min re dermanekî peyda bikin; yan na ez ê serê we tevan jê bikim!
Hekim û bijîşkên qesrê, li laşê Dehakî mêzandin ew pelandin. Çavên wan li du birînên ku li ser her du milên wî bûn ketin. Tev bi hev re mat man. Lê Dehak ji ber êşa xwe her bi ser wan de dikir qêrîn:
- Hûn çi bêçare li ser min rawestiyane! Zû dermanekî bidin min. Hûn doxtir û bijîjkên herî baş û şahreza ne. Ma hûn derman peyda nekin dê kî peyda bike? Hekîmekî ji wan, dest da ber xwe û got:
- Heta niha birîneke weha min ne dîtiye û ne jî bihîstiye. Lê wa diyare ku mêjiyê teze dikare bibe melhema van birînan.
Dehak ferman da ku her roj mejiyên du zarokan bînin, bikin qurbana birînên ser milên wî ku bibûn wek du marên qelişî û dev vekirî. Bi vî awayî, rojê bi mêjiyên du zarokên nûhatî, kulên ser milên Dehak dihatin dermankirin. Lê carina zarok ji vê belayê dihatin xelaskirin. Zarokên ku dihatin xelaskirin li şênaya nedihiştin, rêdikirin çiyan, di şikeftan de vedişartin. Her ku diçû çiya bi mirovên reviyayî tijî dibû. Jiyan di şikeftan de berdewam bû. Ava kanî, dar û ber û fêkiyên çiyan têra jiyana wan dikir.
Demeke dirêj derbas bû. Lê kulên ser milên Dehak bi hev ve nekeliyan. Agir ji devê Dehak dibariya. Tirs ketibû dilê her kesî. Dayik û bav, ji tirsa ku kengê dê dor were zarokên wan xew nediket çavên wan. Tu hêzeke ku tiştekî ji Dehak re bibêje tunebû. Ji tirsa zarokên xwe gellek malbatan berê xwe dabûn şikeft û çiyayên asê.
Kawe, kurdekî hesinkar bû. Zarokên wî jî ji kulên Dehakî re bûbûn qurban. Kawe ji tirsa qurbankirina zarokê xwe yê dawî, heval û hogirên xwe yên pêbawer kom kirin û ji wan re behsa zulm û zordariya Dehak kir. Plana kuştina Dehak ji wan re eşkere kir. Her kesî fikir û planên Kawe pejirandin û li benda îşareta wî man. Kawe gotibû gava ku ez Dehak bikujim, ez ê herim ser banê qesra wî agir vêxim. Ku we agir dît, bizanin ku min Dehak kuştiye. Kawe, ji heval û hogirên xwe re dest bi çêkirina çekan kir û bi dizî li wan belav kirin. Ji xwe re çakûçekî ku mirov pê hesin dikute, çêkir. Gava leşkerên Dehak hatin ku lawê Kawe yê dawî jî bibin, Kawe ji leşkeran re got:
- Hûn herin, ez ê niha, bi destê lawê xwe bigirim û bînim. Ez dixwazim ji bo saxiya padîşahê xwe lawê xwe bi destê xwe bikim qurban û li ber lingên padîşahê xwe deynim. Gava leşkeran ev xeber gihandin Dehak, kêfa wî hat, şa bû û çavên wî ma li riya Kawe. Kawe, çakûçê xwe kir destê xwe, lawê xwe girt û berê xwe da qesrê. Gava gihîşt ber derî, leşkeran dergeh jê re vekir. Kawe, rasterast berê xwe da şahnişînê ku text lê vegirtî û Dehak li ser rûniştî bû.
Kawe, nêzî Dehak bû. Bi çengê lawê xwe girt û bir li ber piyên wî dirêj kir. Kawe çakûçê xwe bilind kir. Lê li şûna ku li serê lawê xwe bide, bi hemû hêz û hêla xwe li serê Dehakî xist. Taca serê wî gindirî.

Kawe hilkişiya ser banê qesrê û agirekî gurr li wir dada. Dema hogirên Kawe çav li êgir ketin, wan jî dest pê kir û êrîş anîn ser qesrê, leşker û hevalbendên Dehak yên mayî dîl girtin, yên teslîm nebûn jî kuştin. Gava gelê li çiyê jî agirê azadiyê dîtin, fêm

kirin ku plana Kawe bi ser ketiye. Dehak hate kuştin û dawiya zordariyê hat. Wan jî li ser çiyan agirê azadiyê pêxist.
Ji wê rojê û bi vir de, her sal, di roja 21-ê meha adarê de, gelê Kurd li seranserê Kurdistanê derdikeve çol û meydanan û cejna xwe pîroz dike. Agirê Kawe, remz û nîşaneya serxwebûna kurdan vêdixînin.
Mele Nûrî bi hatina roja Newrozê re bang li qîza Kurd kiriye û jê re dibêje vaye Newroz dîsa hat, de were em ji qehrê neyaran, bê tirs û pirs, govenda azadiyê bigerînin:

**Qîza ciwan û gulperî**
**Şewq û şemala xweserî**
**Ger tû dixwazî koçerî**
**Mizgîn didim va bû bihar**
**Dakev ji wê asê gehê**
**Adar giha roja nehê**
**Serbest were vê bergehê**
**Bê tirs li ber çavê neyar**
**Şalûl û bilbil bûne ref**
**Hespa cîhan tev kirine kef**
**Saz û bilûr û ney û def**
**Cerga dikin serxoş û har**

Hozên herdem û hergav hana dide gencên gelê xwe ku rabin û tola welatê xwe yê bindest û dagirkirî ji dijminan bistînin. Û li ser rêya bavûkalên xwe yên leheng û mêrxas wekî Rustemê Zal û Keyqubad û Keyxsrew û Kaweyê hesinkar şûr û mertalên xwe tûj bikin û bidin pey pişta neyar û dijminan û Kurdistana delal ji nav dest û pencên wan derînin. Mele çend tepling û gazîdankên cengî ji bona vê mebestê bikar tîne. Ev cure hozan di hozana Erebî de jî, nemaze ya kevin de ciyekî taybet digire. Bi erebî jê re tê gotin şîira "Hemassî" ku li gor şert û mercên wê qonaxê ji jiyana gelê ereb, ev helbest weke çekekê dihate bikaranîn, gava ku mêran radihiştin şûr û çekên xwe û li ber dengê tilîliyên jinikan, berbi meydanên şer û ceng û mirinê ve bê tirs birê diketin, diçûn. Bê guman e ku ev yeka nêzîkatiya gelên navçê-rojhilata nêvê-tekez dike. Mele ku baş û kûr û dûr bi dîroka gel û welatê xwe dizanê, qîz û xortên kurdan qanih dike bi rewatiya kirina şerê jiyanê, cenga azahî û rizgarkirina Kurdistanê. Di teplingên cengî de, mirov tê ku dengê şûr û mertalan bike, û qîr û hayehoyên şervanên di meydanên şerî de bibihîze. Lê ew bi zanebûn vê yekê dike dema ku nav û mînakan ji dîroka kurdan ya kevin tîne û baweriyeke qayîm li bal xwênerî peyde dike. Heye ku li vir were gotin ku ev ne dahêneriyeke nû ye, lê belê xala giring ewe çawaniya bikaranîna vî coreyî ji helbestê. Hozanvanê me bi hişmendî û aqildarî û bi zanebûneke dîrokiya berfireh û bi hesteke netewî ya zelal û coşdar û ya rast û dirust, karê xwe dibe serî û nameya xwe ya pîrozewer digihîne ciyê pêwîst. Û paş ku ew dîroka Kurdistanê li ber çavan radixîne û rohn dike, berê xwe dide ala şêrîn û rengîn ya kurdan. Belê, mirov ji bo ala xwe, xwe didin kuştin û dibin qurbanên wê. Al ne parçeyek caw yan jî qumaş e. Ew sembol û rûmeta milletan e. Milletên bê al weke kesên bê nasname ne. Ala milletekî nîşaneya hebûn û serfirazî û serxwebûna wî milletî ye. Her weha reng û remzên alê derûn û mentalîte û serbora milletan nîşan didin. Milletê Kurd xwediyê aleke rengîn û pîrozewer e. Cara yekê ala rengîn li Komara Kurdistanê ya Mehabadê hate hildan û piştî xiyaneta Stalînê dîktator û prensîb-firoş, ew weke emaneteke giranbuha ji Qazî Mihemmedê Pêşewa gihîşte destê Barzaniyê nemir. Piştî ku demekê di nav dil û damaran de veşartî ma, dîsa roka kurdan hilat û li beşekê Kurdistanê her roj li ber ba dibe û tîrêjên xwe, şewq û ronahiya xwe dide derdorê û asîmanê Kurdistanê dixemilîne.

Ala rengîn ciyekî xweyî taybet di helbesta kurdî ya –eger rast be bêjin- ji destpêka çerxê bîstê de hatî nivîsandin de heye. Bi taybet di helbestên Cegerxwînî de. Her weha, ew di piraniya hozan û stranên stranbêjên kurd yên neteweparêz de tête pesindan û rêzgirtin. Mele Nûrî ku yextiyarî û dewlet û qiral û împerator û sînor û pasevanên sînoran –ku mixabin li her alî dijmin hene- lê bûne yek û nahêlin ew bi vî temenê xweyî mezin çavên xwe bi ala rengîn ya berbi asîmanan ve berz û bilind kil bike, bi hest û xeyalên xwe ve her roj û her gav wê li ber çavên xwe dibîne û di kûrahiya dilê xwe de, vedişêre.

Mele gazîdankek cengî (çepdest) terxanî alê dike û di bin navê-Ala Kurdistan-de weha kela dilê xwe dirêjê:

**Hey gul geşa serfîraz hey rohniya şevreşa**
**Hey dîlbera pir niyaz hey xatûna dilxweşa**
**Hey hêvîdara welat dermankere bê heşa**
**Bûka welatê mezin her cihê germ û qeşa**
**Gewr û sor, kesk û zer çar ji rengê tene**
**Xweş tû ala minî Kurd li bendê tene**
**Şabaş tû ala minî tiwî ser û sermiyan**
**Bo te em gorî dikin xwîn û guman û giyan**
**Çaxê bibî ceng û şer em dê bavêjin jiyan**
**Bo te em dê bimrênin zarok û bav û diyan**
**Gewr û sor, kesk û zer çar ji rengê tene**
**Xweş tû ala minî Kurd li bendê tene**
**Binya te tev leşkerin pirke tû kêf û hewat**
**Kurd va ji ter aniye sed gewher û sed xelat**
**Tû çêke xweş baweşîn hewar ji bona te hat**
**Şewqê ti bavêje ber bajar û gund û kelat**
**Gewr û sor, kesk û zer çar ji rengê tene**
**Xweş tû ala minî Kurd li bendê tene**

Bi îlm, zanîn û marîfeta xwe, Mele Nûrî li ber aliyê netewî tenê jî nasekine, lê belê ew weke mirovekî-nemaze şaîrekî bala xwe dide hemû aliyên jiyana mirov û xurist û pirsên mezin yên jiyanê wekî giyan û roj û şev û bi taybet jî mirin, van jî di gazîdankên hîndişî de bikar tîne. Mirov dikare wan helbestan di nav helbestên felsefî yên herî xweş û watedar di wêjeya kurdî ya sedsala buhurî de bihijmêre. Ew tu gumanê di dilê mirovî de nahêle ku zimanê Kurdî dikare bi hêsanî –ji ber dewlemendî û berfirehiya vî zimanî-bibe zimanê fikr û felsefeyê. Mele bi kûrahî li ser rewşa mirov û jiyan û piştre mirina wî dirame. Gelo ev hemû çima? Ev mirovên wisa xweşik û geşik çima vê kedê dikin û cîhanê rû bi rû ava dikin û ji hevdû hez dikin û di dawiya bê mefer de yek bi yek dimirin, dibin hestî û xwelî û tevlî axa xwe ya pêşîn dibin, diçin. Gelo li paş mirinê çi heye? Erê mirin bi xwe çiye? Mirov çine? Jiyan çiye? Jiyan xewneke, lê xewn çine? Welat û bajar û gund û parzemîn çine? Roj çiye? Şev çine? Hezkirin çiye? Mêr û jin çi ne.....Çima mirov tên dinyayê, çima diçin?

Mele Nûrî bi van pirs û pirsgirêkan ve mijûle û çeka wî –nemaze ewa niha hev dikare biaxive-her pênûsa wî ye. Roj derbas nabe ku Mele Nûrî ne ramê û ne nivîse, lê niha ew ketiye taya mirinê de, wek her mirovekî tirsa wî jî ji mirinê heye, ji ber ku mirin em hemû jî jê ditirsin, ji ber ku mirov ji tiştê ku bi wan nizane û tênagihe ditirse, lê hertişt li alîkî û mirin li alîkî dine. Sosrete, çîrok hemû bi vegera kesekî ji mirinê çareser dibe, lê belê kes ji mirinê venegeriyaye û dê venegere jî. Derdê mirinê dijwar e û kes nizanê wê çi bike û çawa û kengî were, lê kes ji mirinê nafilite. Mirin evîndaran ji hev dûr dixîne û mirovan di bin baskên xwe de wenda dike. Melê dike û nake tiştekî ji vê sosreta hanê fêm nake, radibe radihêje pênûsa xwe û kesera dilê xwe li ser rûyê kaxezên sipî rêj dike:

**Hey wax ji derdê mirinê ez pê nizanim wê çikî**
**Ev bê dila pir ijdehar Bo çî me dê winda bikî**
**Qîza ji ber xortan dibî axîn ji dil der nakevin**
**Îdî nema peyvê dikin mîna kesê kû bê devin**
**Geh bav diçî geh dê diçî zaro dimînin bê xwedî**
**Îdî nema ew têr dixun lewra dikin tirs û fedî**
**Hey mirinê ka min çi dî kû ez ji cîhanê herim**
**Qey tê bihêlî carekê pey mirinê ez vegerim**

Na! Kes ji mirinê dê venegere, lê belê Melê gellek tişt dîtine di cîhanê de, lê belê mebesta wî dîtina dewleta kurdaye û ala wanî ser fîraz….

**Xwezya berî ez bimirim peyda kirba min derman**
**Ew bû kû min bidîta bûye dewlet Kurdistan**
**Leşker çêkin bezrînê li Barzan û li Batman**
**Xuyabî ala rengîn li ber derya Loristan**
**Zînim tînim dibînim ber çavê xwe Kurdistan**
**Dîn û bê hiş dimînim ji av û bax û bustan.**

Bi van xewnan, di yextiyariya xwe de Mele Nûrî her şev serê xwe datîne û radizê. Gelo li vî beşê me yê azad-başûr-ma ne hêjaye em hin xewnên Mele Nûrî û kesên wek wî bicî bînin û jê re temamiya nivîsên wî di çend cildan de ji reşahiyê derxênin ber ronahiya ku dişibe roja ku ciyê xwe di alaya kurdan de girtiye??? Gelo ev al dê li xwediyên xwe, xwedî derkeve...

***

www.arsivakurd.org

agiri

**Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail:**
**agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@googlemail.com**




## Li Rojhilatê Kurdistanê Lehiyê Jiyana 3 Kesan Stand



Di encama barîna xurt a baranê li piraniya gund û bajarên Rojhilatê Kurdistanê de û rabûna lehiyê, 3 kesan jiyana xwe ji dest da û zirar û xisarên zaf gihîştin welatiyan.

Barîna tund a baranê di rojên 10-11'ê Îlona 2008'an û rabûna lehiyê jiyana xelkê li bajarên **Urmiyê**, **Mehabad**, **Selmas**, **Pîranşar**, **Tikab**, **Xoy**, **Bokan**, **Serdeşt** û çend bajar û deverên Parêzgeha Îlamê rastî pirsgirêk û dijwariyan kiriye. Li Selmasê kesek û li Pîranşarê 2 kes bi sedema lêmiştê mirin, xisar û xizaniyên zaf gihîşte gundan û avahiyên bajaran û gellek malatê xelkê ji nav çû. Her wiha rêya navbera gund û bajaran jî rastî astengan hat. Li Urmiyê lehî bû sedem ku ava vexwarina bajar heta 24 seetan şêlû bibe û bi tankeran av ji bo welatiyan dihat parvekirin. Îdare û organên têkildar ên Komara Îslamî tu hewlek bona alîkarîkirin bi xelkê û qerebûkirina xisar û ziyanên welatiyan nedaye û jiyan li xelkê dijwar bûye.

## Zêdebûna Nifûsa Japoniyan Ku Temenê Wan Bêtirî 100 Sala Ye



Serhejmariya herî nû xuya dikin ku niha hejmara Japoniyên ku temenê wan zêdetirî 100 sala ye, bêtirî 36 hezar kesan e. Bi vê yekê Japoniyan rekorda cîhanê şikandin. Di sala borî de, li Japonê 4 hezar kes ji kesên temendirêj ên jorî 100 salan re zêde bûne. Beşeke mezin ji kesên han jin in. Di nava welatên cîhanê de herî zêde Japonî bi jiyanê hêvîdar in..

Heta dawiya meha Îlona 2008'an, hejmara jinên Japonî ên ku temenê wan ji 100 salan derbaz bûye, bo cara yekemîn ji 31 hezar kesan bihurî, çavnihêrî tê kirin heta sala 2050'an, hejmara Japoniyan ku temenê wan bêtirî 100 sala ye, bigihîje 1 milyon kesî. Hêvîdarbûn bi jiyanê merca bingehîn a temendirêjiyê ye.

**Rojnameya "MIDDLE EAST TIMES":**

## "RENGE Dİ DAWİYA ÎSAL DE ÊRÎŞÎ SER ÎRAN BÊ KİRİN"

MIDDLE EAST TIMES

Rojnameya "MIDDLE EAST TIMES", Çapa Îngilîstanê roja yekşem, 14'ê Îlona 2008'an, nivîsand: renge di navbera meha Çiriya Paşîn heta Çileya Pêşîn de, Îsraîl êrîşê bo ser Îranê bike. Ji ber ku Îran gefek li dijî tenahiya wî welatî ye.

Vê rojnameyê nivîsî ye, heke rejîma Tehranê bernameyên xwe ên Etomî bidomîne, Îsraîl di navbera Çiriya Paşîn a îsal û Çileya Pêşîn a sala tê de dê êrîşa leşkerî bike ser Îranê.

"MIDDLE EAST TIMES"ê nivîsand, yek ji wan kesên ku bi piştrastî di vê derheqê de diaxive, Nîkola Sarkozî, Serok Komarê Fransayê ye ku di gera xwe a vê dawiyê de ji bo Sûriyê, hişyarî da rejîma Tehranê ku heke xebatên xwe ên navikî bidomîne, dê rastî xeter û gefa êrîşa leşkerî a Îsraîlê bihê.

**Rêxistina Tenduristiya Cîhanî:**

## "Ne Wehkeviyên Civakî, Sedema Mirina Mirovan"



Rêxistina Tenduristiya Cîhanî lêkolîna xwe ya herî nû derbarê mirinên ji ber ne wekheviyên civakî weşand. Serbarê vê yekê ku dewlemendbûn di serdemê cîhanîbûnê de pêşde çûye, xurt bûye, lê valahiya navbera xizan û dewlemendan di van salên dawiyê de du qat zêde bûye.

Ev rapora Rêxistina Tenduristiya Cîhanî roja 28'ê Tebaxê hate weşandin û li gor rapora han, ne wekheviyên civakî, sedema herî zêde a mirin û gorîbûna mirovan di asta cîhanê de ye.

Di raporê de hatiye destnîşankirin, serhejmariya herî xirab, li welatên di halê geşekirinê de ye. Bo nimûne, li welatê Nîcerê (li Afrîqaya Rojava) ji her 4 zarokan, yek berî gihîştin bi temenê 5 saliyê dimire.

## 774 Milyon Nexwendewar Di Cîhanê De



Sekreterê Giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di peyamekê de bi henceta 8'ê Îlona 2008'an, Roja Navneteweyî ya Xwendewariyê got: Ji bo xwendewarkirina 774 milyon nexwendewaran di cîhanê de, dê hewcedariya me bi siyasetên baş pênasekirî û sermayedanîna berfirehtir hebe. Ban Kî Mon di peyama xwe de destnîşan dike ku ji her 5 kesên kal û temenjor kesek nexwendewar e. Wî got: Vê gavê 75 milyon zarok naçin xwendingehê û bi milyonan ciwan ji ber bidestnexistina dahateke normal ji xwendinê ku bona jiyana civakî hewce ye, dest ji xwendinê ber didin.

Sekreterê Giştî yê NY dibêje: îsal mijara Roja Navneteweyî a Xwendewariyê, "**Xwendewarî û Tendurustî**" ye ku li ser pêwendiyên van du mijaran tekezê tê kirin. Nexwendewariyê bandoreke rasterast li ser tendurustiyê heye. Nexwendewarî dibe asteng ku xelk nekare destûra nivîsandî a ser dermanan bixwînin û her wiha bi wê wateyê ye ku xelk bi kêmî derbarê (HIV), Malarya û nexweşiyên din ên bi xeter haydar bibin û bizanin.

www.arsivakurd.org